

Pirsyar û bersiv


Boçî hindek fêqî yê şirîne û hindekê dî yê tirşe?

Wek em hemu dizanîn,
hindek corêن fêqî wek..
gundor, şitî, tirî û mozê di
irînin. Hindek jî wek
lîmon, sindî, pîrteqal,
hinara ji tirşin. Di hemu
corêن fêqî da şekir û
tirşatî heye. Şirînî û
tirşatîya her fêqîyekî jî
vedigere rîjeya wê şekir
û tirşatîyê.



Bo nimûne.. Di tirî da rîjeya şekirê Hindek fêqî hene rîjeya şekir û tirşatîyê têda
ji tirşatîyê pitire ji ber hindê tama wî hindî êke, tama wan core fêqîya ya mize. Wek
şirîne. Lê di lîmonê da rîjeya
tirşatîyê pitire, ji ber hindê jî tirşe.

Fêqî dema hişk dibe şirîntir lê dihêt. Ji ber
ku tîrbûna şekirê pitir lê dihêt û ji ber hindê
meywe ji şirîntire ji tirî û hijîra hişk kîrî jî ji ya
xav şirîntire.



Kengî û li kîrê berçavk bo yekemîn car hatîne çêkir

Em dizanîn gelek corêن berçavka hene. Hindek ji wan bi
kar dihêن da ku çav baştıribîbînin, hindek jî ji bo ku çavan ji
tîrêjên rojê biparêzn û hindekê dî ji layê pilot û wênegiran
ve bi kar dihêن da ku li tarîyê bîbînin. Kes bi dirustî nizane
kengî û kî yekem car berçavk bi kar ïnaye. Lê li sala
(1266ê Roker Bikon)î goyeka şûşeyî dane ser rûpelê
kitêbekê û de ku peyy têra mezin diyar bûn li sala (1352)ê
kevalek bo Kardinal "Ocîn"î hatîye çêkirn têda berçavk li
ber çavêن wî hene. Ji ber hindê em di şêym bêjîn ku ber-
çavk di navbera 1266ê û 1352ê zayîni da derkeftîye.
Bakûrê ealya û başûrê Elmanya yekemîn cih bûn berçavk
lê hatîne çêkirn ji ber ku li wêrê kargehêن şûşey hebûn.



Entrnêt çi ye û kengî derketîye?

Enternêt tora navneteweyî ya zanlıstik û agahîyane. Enternêt me zintirîn deskefte, mirovatîyê di biyavê peywendî bi êkkirinê da bi dest ve înayî. Li destpêkê hindek zanayên Bireanî şîyan zanlıstikyan ji kompûterekî veguhê zine êkê dî bi rêka dezgeyekî ku niha navê wî (Modem)e. Paşî zanayê Bireanî (Tîm Bîmdirzî) li sala 1989ê bo cara êkê ev rêke berfireh kir û pêş êexist. Li destpêkê enternêt ya sinordar bû lê paşî her du vekoleran (Mark endîrsin) û (Erîk Beta) li sala 1993ê berfireh kir û gehande formê wê yê evro.



Bileztrîn otombêla cihanê Kijane?



Bileztrîn otombêla cihanê, otombêleka asayı nîne û hêsta li ser cadeyan nahête hajotin. Lê tîmekê endazyarên Yabani ew çê kirîye. Navê wê (Elika)ye û leza wê digehee (370) kilomêtran di se'etê da li ser heşt(8) tairane. Ev otombêle bi wezya kahrebê kar dike.